DIVÊ TE BIBÎNIM

Behrî Reşîd

divêt te bibînim.
Ez rasteyeka berze me,
dereweka ber çav e
hemî dibînin tenê,
ez nebim.
Li xwe digerim
xwe dikujim,
da ku rastiya xwe
bizanim.
Hemî rastî
hizreka aşopî ne
lew min dibînin
gerok.
Li xwe digerim
divêtin min jî
hizreka xwemalî
hebet,
tê da bibim rasteyeka aşkera.
Li xwe digerim
xwe di direweka befrîn da
dibînim.
Li xwe digerim
xwe di awêneyeka herimî da dibînim
Lewa gelek caran
li vê û li vê rastiya
ez tê da dibarînim.
Li xwe digerim
û ezeka xwedayî
herbûna min e!.
Li xwe digerim
ezeka mirî
û di kirasekî
derewiyê da
Nav û nîşanê min e!
li xwe digerim.
Di navbera (wan û wî û yê dî da) û
dibim kelwaşekî genî
û ji xwe direvim.
Li xwe digerim û
xwe di te da (herî)
dibînim.